

Dumahîk: XWE JI BAVÊ XWE ...

çêtir dixwîne. Îcar min çi kir, min izna xwe ji bavê xwe xwest ko herim Amûdê û li cem seydayê Evdilhelîm ilmê erebî bixwînim. Lê mexseda min tiştêkî din bû..

Min ştexaliya xortê xwe li hire birî û jê pirsî: Ma çire ev derew. Te çire ne got bavê xwe ko tu herî Amûdê da ko hînê xwendina kurdiyê bibî?. Xortê min bi kenê xwe ê şêrîn kenî û got: Ezbenî min ji bavê xwe re rastî bigota tucaran izna min ne dida. Ewê ji min re bigota ma tu dixwazî kafîr bibî. Axir serê te neêşînim, bi vê derewê ez çûm Amûdê û bûm feqehê seydayê Evdilhelîm. Rojê saetekê li cem seydayê xwe rûdiniştim, ewî jî dersa min digot. Wekî din temamî wextê xwe li nik hevalên xwe ên kurd û kurdparêz dibihart. Li Amûdê li ba Hişyarê Licî bi kurdî elimîm û gihaştim daxwaza xwe.

Tu dibînê ezbenî çire xwendina kurdiyê zehmet e. Ne ji ber herfên wê lê ji ber mezinên me.

Min gote xortê xwe: Niho tu bi xwe seyda yî, seydayê kurdiyê. Di gundê de xelkê xwe hînê kurdiyê dikî?

-Gelek hindik û dizîka. Xort dixwazin hîn bibin lê ji mezinan ditirsîn.

-Ma ew mezin kî ne?

-Ma tu bi xwe nizanî ezbenî, şêx û axa.

Min ştexalî li hire birî, ji ber ko xortên ko guhdariya vê ştexaliyê dikir dest bi çêr û dijûnan kiri bû.

Ez vê çîrok biserhatiyê berpeyî şêx û axayên xwe dikim û hew. Heçî zane ji xwe zane, heçî nizane...

Her bijî Cengebazê Cibrî, Xwedê te bihêle yên wek te di nav milletê kurd de zêde bike.

RONAHÎ- Hejmar 7- Pêncşemb- 1 Çiriya Pêşîn 1942-Rûpel 7/(115)

Ji bîranên zarotiyê...

RIŞTA

Dilêrê Kurd

Hîna ez biçûk bûm, temenê min heft sal bû, dema li gundê me dibû cejin yan sersal, dayika min dihelçeniya, dikir şabaş û digot:

Gelî biçûkan, gelî mindalên min ên hêja û delal, ez ê rabim ji we re xwarinekê çêkim, di jiyana xwe de, we bi çavan nedîtiye ne jî we xwariye, xwarineke gelek xweş û paqij û temîz e, hûn ê tiliyên xwe pêre bixun!!...

Me dilhayî li dayika xwe temaşe dikir ka bê ewê çi bike û çilo wê xwarina salixdayî çêke. Dayika me Ard dixiste legenê, av berdida ser, dikire hevîr û ew hevîr baş distira, paşê wê ew hevîr dikire girêk, li ser textekî, bi teşiyê ew girêk tenik dikir ta weke pela sîrê dibû, paşê bi kêrê, ew terîş terîşî

dikir, û ew terîş li ber tavikê datanî ta hişk dibû. Ji nû ve ew dixiste teşte û li ser agirê tifikê diqeland û sor dikir... Bi nazikî ew dixiste beroşê û kelek didayê, paşê ew rûn dikir, û çend lib hêk jî dixiste nav û li ber me datanî.

Em lê dipiçikîn, dibû şinge-şinga kevçiyên û qîje-qîja birçiyên. Yek-dido, me di binê firaxê de bang dida!! Piştî ku me zik dikire dahol; Em li dayika xwe dizivirîn û dipirsîn, bê ka navê vê xwarina xweş çî ye!?. Dayika me dest û devên me dişuştin û digot: "Lawo, navê vê xwarinê **Rişta** ye".

Bi rastî, ew xwarineke gelek xweş bû, ta niha, xweşbûna wê di bin zimanê min de ye û ez wê ji bîr nakim.